

# ALSO

Alîkarîya xweser ya Bêkarîyê Oldenburg e.V.

Şewirmendî li Bajarokên Vechta û Oldenburg

Vechta: 0157-83420682

Oldenburg: 0176-43302127

www.also-beratung.de

lk-beratung@also-zentrum.de



Divê ez deyna bikim, ji bo ku ez bikaribim li Malekî bi Mobilya bijîm? - Na, ji ber ku Sazîya Kar (Jobcenter) û Sazîya Sosyal (sozialamt) ji bo Kesên hatina wan kêr, alîkarîya Rêkûpêkirina Mal û Metbexê (Küche) û kirîna Mobilya dike.

Gelek caran Kesên ku Xaniye kî kirê dikan, pêwîstîya wan bi Mobilya jî heye, ji ber ku gelek Kes ne xwedî alavên pêwîst yê Malekê ne û dibê ku gelek Kes divê rewşê de bin:

- Mirovên Temen Ciwan, ku hîn bi serê xwe Xaniyek kirê nekirine.
- Mirovên ku heta niha di Xaniyê ku bi Mobilya yê xwedîyê Xanî ve, di kirê de bûn.
- Mirovên ku ji Hevala/Hevalê xwe cîhê bûne.
- Penaberên ku di Heyima de diman û mafê Xanî kirêkirinê bidest xistine.
- Mirovên ku berê Bêmal û Bêxanî bûn.

Me li vir çend Mînakên ku gelek caran rastî me tên û pêwîstîya wan bi rêkûpêkirina Mal û Xanî hene, nivîsand. Em dizanin ji derveyî van Mînaka jî gelek Kesên din hene, ku di Rewşên wusa dene. Bi dilekî rihet ji me bipirsîn.

Di hemû Rewşên wusa de pêwîstîya we bi rêkûpêkirina, yan ji bo giştî yan jî ji bo beşekî Malê heye. Yê ji we ku Livîn yan jî hinek Firaxên wan hebin û pêwîstîya wan hîn bi gelek tiştên din hebin, alîkarîya beşekî distînin.

Rêkûpêkirina Mal ya destpêkê, ji Metbex, Beroş, Firaxên Kehrebî, Firaxên Xarinê, Xurfa Rûniştinê, Xurfa Razanê, Xurfa dest û serşuştinê, Mobilya ji bo Salonê, Lempê û Perdeyan pêktê.

**Wateya wê:** Çi kesên pêwîstîya wan bi Rêkûpêkirina destpêkê hebî û Alîkarîyê ji Sazîya Kar yan jî, ji Sazîya Sosyal distîne, xwedî mafîn, Alîkarîya Rêkûpêkirina Destpêkê bistînin. Wekîdin tê wê Wateyê: Extra, wekî Alîkarî, ne tenê wekî Deyn! Yanî pêwîstîya Mirov pê tinne, xwe ji bo wê Deyndar bike.

## Agahî ji bo Firaxên Metbexê:

Wekî Rêkûpêkirina Destpêkê, Maf ji bo Metbexekî temamî, weku bi navê 'Firaxên Sipî' tên binavkirin; Firin, Dolaba Cemedê, Mekîna Cila, ku nû (Firaxê Nû) ne û

bikarhatî ne heye.

Divê Doşek jî wekî firaxê Nû bê dayîn. Hemû Firaxên dinê divê ji Firaxên baş û pakij bikarhatinê bê dayîn.

Sazî divê van Firaxa wekî 'Sachleistung' bide we, Wate ya 'Sachleistung', piştî ku we ji bo xwe Firax ecibandin, pêwîste ew Firaxana yan ji aliyê **Diakonie** yan jî ji aliyê **Mehrwert** ji bo we bê anîn. Alîkarîya Rêkûpêkirina Destpêkê wekî Dirav tê standin; ger hin Firax li cem **Diakonie** yan jî **Mehrwert** peyde nebin ( piştî sê caran lê pirsînê, hîn jî peyde nebin, bi awayekî nivîskî belge bikin ku firaxê ku ji were lazime li wur peyde nabe).

**Girîng:** Wekî anîna Firaxa ji aliyê **Mehrwert û Diakonie**, barkirina Mobilya heta Malê û girêdana Firinê bi prîza Kehrebê jî li ser wane. Divê hûn heqê wan ne ji bêrika xwe bidin, ger ev Tişt ji aliyê Rêveberîyê li ser Kaxezê nehatebe nivîsandin jî.

## Daxwazî ji bo Firaxên Nû

Ji bo Mirovên ku ji ber sedemên Olî û Çandî, Firaxên Kevn û yê bikarhatî nikaribin bikar binin, Hemû Berpirsyarên Firaxên rêkûpêkirinê amadene, ji bo wan Kesan Firaxên Nû peyde bikin. Mînak, ji bo Gelê Sintî ku ji ber Çanda xwe nikarin hin Firaxan bikar binin. Mînak, ger Firaxên rêkûpêkirinê ji aliyê nexweşa bikarhatibe. ( Dadgeha Federal ya Sosyal Biryar ji 28. 10. 1987, 7 RAr 8/86).

**Em Bawerin gelek Pirsên we yê din, derheqê Alîkarîya Rêkûpêkirina Destpêkê ya Mal, ya Sazîya Kar hene. Em Amadene ji dil alîkarîya we bikin. ALSO ya we.**

## ALSO – Şewirmendî

**Ji Kerema xwe berê xwe bidin Infolyer ya zer ya ALSO yan jî bi rêka E Mail Hevdîtinekê bi me re girêbidin.**

**lk-beratung@also-zentrum.de**

Gefördert durch:



Niedersächsisches Ministerium  
für Soziales, Gesundheit  
und Gleichstellung